# Vexwarina avê piştî lehiyê

## Zanyariyên ser kingî û çawa meriv bi ewlehî piştî lehiyê avê vexwe

**Kurdish Kurmanji | Kurdî Kurmancî**

**OFFICIAL**

Piştî lehiyê, dabînkerê we yê avê dê ji we re bibêje ka ava we ya vexwarinê ewle ye yan na. Ew mimkin e van biweşînin:

**Tewsiyeya venexwarina avê**: Ava we madeyên kîmyayî û jehrên zirardar hene û vexwarina wê dikare we pir nexweş bixe.

**Tewsiyeya kelandina avê:** Dibe ku di ava we de mîkrob hebin û divê hûn berî ku vexwin avê bikelînin. Vexwarina ava nekelandî dikare we nexweş bixe.

### Eger hûn nikaribin ava lûleyan vexwin divê çi bikin

Eger saziya we ya avê 'Tewsiyeya venexwarina avê' weşandibe, hûn nikarin ava lûleyan vexwin.

- Divê hûn:
  - ✓ ava lûleyan ji devera bandorkirî venexwin
  - ✓ nekelînin, avê bi klorê an spîkerê derman bikin ji ber ku kelandin ê wê ewle neke.
- Ava şûşê ji bo vexwarinê, amadekirina xwarinê, tiştên vexwarinê û şîrê hişk ê zarokan, çêkirina qeşayê, firçekirina diranan an ava vexwarinê ya heywanan bikar bînin.
- Di hin rewşan de, hûn dikarin ava lûleyan bi kar bînin da ku tiwaletan bişon, destên xwe bişon, serşokê bişon (piştrast bin ku av neçê xwarê) û cilan bişon. Eger çermê we dixure yan bertekeke din bibînin, bikaranîna avê rawestînin û bi bijîşkê xwe re têkilî dayînin.
- Dabînkerê we yê avê dê we agahdar bike kingê vexwarina ava lûleyan ewle ye.

### Eger pêwîst bike ku ava lûleyan bikelînin çi bikin

Eger dabînkerê we yê avê 'Tewsiyeya kelandina avê' weşandiye, divê hûn ava lûkeyan bikelînin.

- Ji bo kelandina ava lûleyan da ku vexwarina wê ewle be:
  - ✓ heya ku ji binê qasikê an çaydankê gelek qilpikan bo demeke domdar bibînin, avê bînin ber kelandinê.
  - ✓ berî vexwarinê, avê sar bikin.
  - ✓ çaydankên bi bişkokên qutkirina xwebixwe guncaw in. Çaydankên bi germahiya guhêrbar divê bo kelandinê werin danîn.
  - ✓ ava kelandî di firaqeke paqij û girtî de hilînin
  - ✓ berî vexwarinê, avê sar bikin
  - ✓ divê baldar bin ku bi ava kelandî xwe neşewitînin.
- Ava kelandî divê bo vexwarinê, amadekirina xwarinê, tiştên vexwarinê û şîrê hişk ê zarokan, çêkirina qeşa, firçekirina diranan an ava vexwarinê ya heywanan were bikarbînin.
- Ava nekelandî dikare ji bo şûştina destan, serşûştinê (pê bawer bin ku av neçe xwarê), şûştina tiwaletan, şûştina firaq û cil û bergan û baxçevanî an şûştina li derve were bikaranîn.
- Dabînkerê we yê avê dê we agahdar bike kingê ew ewle ye ku ava lûleyan bêyî kelandin vexwin.

### Alîkariyê wergirin

- Ji bo zanyariyan bi dabînkerê xwe yê avê re têkilî dayînin <www.water.vic.gov.au/water-industry-and-customers/know-your-water-corporation>.
- Eger hûn bi fikar in ku we ava gemarî vexwariye yan jî nîşaneyên wekî zikêşê hene, bi bijîşkê xwe re têkilî dayînin.

Bo wergirtina vê belavokê bi formatê guncaw, emailê bişînin pph.communications@health.vic.gov.au